# Ambliyopî di Zarokan de - Divê Dê û Bav Çi Bizanin?

## Ambliyopî çi ye?

Ambliyopî (bi zimanê rojane: çavê tiral) ew rewş e ku tevî ku çav bi awayekî organîk tendurist e jî, çavek ji çavê din lawaztir dibîne. Mêjî çavê baştir dibîne tercîh dike û hişyariyên dîtbarî yên ji çavê lawaz tên pêpes dike. Di encamê de, ev yek dike ku di çavê bandorlêbûyî de dîtin di seyreke asayî de bi pêş ve neçe.) ew rewş e ku tevî ku çav bi awayekî organîk tendurist e jî, çavek ji çavê din lawaztir dibîne.

## Tedawiya pêşwext çima girîng e?

Heta 10 saliyê, sîstema dîtinê guncav e ji pêşveçûnê re. Heke ambliyopî di vê heyamê de bê ferqkirin û tedawîkirin, şansê dîtina normal gelekî zêde ye. Di temenên pêştir de başbûn bi gelemperî ne pêkan e.

## Ambliyopî çawa tê tedawîkirin?

Rêbaza herî berbelav û bibandor tedawiya okluzyon e ku bi banda çavan tê kirin. Di vê tedawiyê de çavê baştir dibîne bi demborî tê girtin û çavê lawaz tê şixulandin. Herwiha, dibe ku bikaranîna berçavkê an jî di rewşên taybet de tedawiya dermanî jî pêwîst bike. û çavê lawaz tê şixulandin. Herwiha, dibe ku bikaranîna berçavkê an jî di rewşên taybet de tedawiya dermanî jî pêwîst bike.

## Kî tedawiya ambliyopiyê pêk tîne?

- **Bijîşkên çavan:** Teşhîsê dike û heke pêwîst be, reçe teya berçavkê/bandê dinivîse.
- **Ortoptîst (terapîstên dîtinê):** Testên taybet pêk tîne, maweya pêvekirina bandê diyar dike û pêvajoya tedawiyê dişopîne.

## Gelo dê û bav dikarin çi bikin?

- Çûyîna kontrolên çavan di temenên biçûktiyê de (bi taybetî heke di malbatê de pirsgirêka dîtinê hebe)
- Pêkanîna tedawî ya bibiryar û li gorî zarokî/ê
- Motîvekirina zarokî/ê - tevî bandên rengîn, nêzîkati yeke hengdar û gelek pesindan

## Ambliyopî çawa çêdibe?

Sedemên herî berbelav ev in:

- **Şaşî (şehitîna çavî)**
- **Qisûrên dîtinê** (bo nimûne; hîper metropî, miyop, astîgmatîzma)
- **Xerabûyîtiyên dîtinê yên yekalî,** yên wekî kataraktа ji zikmakî
- **Qisûrên dîtinê yên tedawînekirî** di heyama zarokatiya destpêkê de

Ambliyopî di jiyana rojane de yekser nayê ferqkirin lewre çavê xurt çavê lawaz „telafî dike". Ji ber vê yekê heke tu semptomên diyar tune bin jî, muayeneyên çavan ên pêşwext, pir girîng in.



## Xerabûyîtiyeke dîtinê ya muhtemel çawa tê ferqkirin?

Li van nîşaneyên jêrîn baldar bin:

- Şaşî an jî xwarbûna serî ya domdar
- Kirpandina çavan, kusandina ça van an jî mistdana çavan
- Hesasiyeta li hemberî ronahiyê, lerizîna çavan
- Damanî, nehingaftina tişteyan dema rahiştina wan
- Dijwariya xwendinê, westîna zû
- Serêşî, belawelatiya baldariyê

PIRATOPLAST®
Sanft zur Kinderhaut